

Agahdarî ji bo Dayik û Bavan derbarê Xwendina bi dengê bilind û

Dayik û Bavên birêz

Bihevrexwendin û çîrokbêjî hemî zarokan teşwîq dike. Ji ber ku zarok ji çîrokan hez dikin. Bi alîkariya xwendina bi dengê bilind zarok fêrî guhdarîkirin û axaftinê dibin. Her weha ev tişt alîkariya wan dike ji bo ku kari-bîn xwe bi xwe hestên xwe derbirînin.

Bi vê pirtûkê re hun dikarin bi malbata xwe re jiyana rojane ya Elmaniya nas bikin û fêrî peyvên destpêkê yê zimanê Elmanî bibin. Ji bo xwendina bi dengê bilind û çîrokbêjiya bi hev re em demeke pir xweş ji we û malabata we re dixwazin.



Bi hev re jiyana rojana li Emaniya nas bikin!

Çi li yarîgehê an jî li bazarê heye, ku mirov nas bike? Bi zaroka xwe re li ser wêneyên di pirtûkê de biaxive "Em dost in". Bijmêre, ka tu çî di wêneyan de dibînî, yan jî pirsan li ser wan wêneyan bike. Wisa ji ber xwe hêdî merov dikeve nav axaftinên li ser jîngeha hawîrdor û serpêhatiyên rojane.



Bi hev re peyvên zimanê Elmanî yê destpêkê nas bikin!

Tu dikarî li ser her rûpelekê dualî ji rûpelên pirtûkê hindê gotinên elmanî bibînî, ku ji boy wêneyî bikêrhatî ne û her wiha kodeke QR di baloneke axaftinê de. Heger tu bi mobayla xwe koda QR skan bikî, êdî dê ew gotin ji te re werin xwendin. Bi vî awayî tu dikarî bi zaroka xwe re bi şêweyekî leystokî peyvên destpêkê yê zimanê elmanî nas bikî û fêr bibî.



Bi hev re bi dengê bilind bixwînin û çîrokan bibêjin!

Bi rêya xwendina bi dengê bilind hun demên têr û tije bi zaroka xwe re derbas dikin. Ev yek we nêzîkî hevûdin dike. Zaroka te wê vê demê bi hestên pir xweş ve girêbide. Her weha ev yek wê alîkariya zaroka te bike, ku di siberojê de ew bi xwe baş fêrî xwendinê bibe. Tu ne mecbûrî bi zimanê elmanî bi dengê bilind bixwînin, hem bi wî zimanî bi dengê bilind bixwîne, ew zimanê, ku tu pê bi zaroka xwe re diaxivî.

Dezgeha Xwendinê Programa „Xwendin me pêş ve dibe. Destpêkirina xwendinê ji bo zarokên penaber“ li gorî daxwaza Wezaretê federal ya Xwendin û Lêkolînê birêve dibe.

Ji bo Xwendina bi dengê bilind û Çîrokbêjiyê em demeke pir xweş ji we re dixwazin!

www.lesen-bringt-uns-weiter.de

